LALEŞ

Şîlan Hemo

Li tewafêye îro
Dîroka kurdistan
Bîna serbestyê
Azadyê
Çi kûr deryaya xewnaye?
Şêrîntirîn bîn bîndikim
Ne beybûne
Ne enbere
Li ber dergehê te laleş
Di hundirde xwe dibînim
Pêxasim
Serxweşim
Ji arê vîn
Û xemla viyanê
Kanyên Metîn
Hemrîn û Hindirîn
Vê azadyê veduxon
Li Amed
Mehabad
Qamişlo û Botanê dinerim
Ji neqşên welat hîndibim
Di neynika tede Laleş
Rûpelên Avista pîroz
Gelo çi dixwînin?
Em guhdarin
Bêje laleş
Emê bixwînin vê roka rûgeş